

Têkoşîn berdewam e: Helwesta IRPGF



Rola IRPGF

Hêzên Gerîlaya Gel ên Navnetewî ên Şoreşgerî (International Revolutionary People's Guerrilla Forces, IRPGF) kolektîfeke mîlîtan, çekdar û xwebirêvebirî e ku ji bo parastina şoreşen civakî di her warê cîhanê de, rûbirûbûna yekser bi sermaye û dewlet ve û pêşxistina doza anarşîzm dixebite. Em pênase û beyan dikin ku ji bo çalakiya bi prinsîp siyaseta bi prinsîp pêwîst e. Em ne partî yan platformeke siyasî lê zêde wekî kolektîfeke çekdar in ku ji heval bi nêrînên anarşîst ên cûda pêk te. Yekîtiya kolektîf a IRPGF di prafîka çalakiya mîlîtan de bingeha xwe digre ku em wekî pêdiviyeke ji bo pêkanîna rizgarî digrin dest. Du aliyêن rola me hene: bibin hêzeke çekdarî ku dikare parastina şoreşen civakî ên rizgarî di her warê cîhanê de rake, di heman demê de jî bibin hezeke ku xwedî imkanên serhildan û têkoşîn li dijî hemû şekilên desthilata kyriarkî ku derê jî hebin e.

Em nekevin deverêن şer bi daxwaza dayîna fermanan lê, bê ku em xweseriya xwe wekî kolektîf berdin, bi daxwaz ku aliya komên din ên çekdar di şer de bigrin ji bo doza hevgirtin bi kes ku bindest, kole û ber bi tunebûn de ne ve. IRPGF bawer dike ku çalakiya kolektîf, hevgirtin û yekîti ji têkoşînê re pêwîst in. Hevgirtina navnetewî çeka herî bi hêz ya kesên bindest e. Di heman demê de em pêwîstiya rexne, kengî û kû derê bi heq be, derxin holê. Rexne û rexne dayîn ne tiştekî ku were tırsîn. Gerek wekî kaniya enerjî ya sabît ku şexs, civak û tevgerên şoreşgerî ber bi pêkanîna rizgarî ve davêje mirov ji van nêzîk bibe.

Pêwîstiya têkoşîna çekdarî

Di nava tevgerên rizgarî de kendaleke kûrtirîn heye di navbera wan ku bi şewazên aşitîdar rû didin dijmin wan ku hem civakên xwe hem jî xwe bi reya têkoşîna çekdarî diparêzin. Di nava van helwestên dubeş de toreke intersekşyonal a helwest û nasnameyên civakî heye ku cih, çarçove û naveroka wan diyar dikin. Li gorî IRPGF şewazên aşitîdar nikarin rû bidin dewlet û vê hilweşînin. Lê belê berovajî derkeve holê. Ew dijmin diparêzin, xurttir ûbihêztir dikin, û şekilên desthilat li dijî şexsên zêde û zêde bi tenê û civakên parçebuyî zêde dikin. Em bawer dikin ku rizgarî ji lûliya çek ve pêş diçe.

Serhildan û raperîn di her warê cîhanê de heta dawî wê bênen meşandin. Em ji bo parastina jiyan şer dîkin û ji bo rizgariya bê kêmânî têdikoşin. Netew-dewlet, iqtidarî, sermaye û hîrâşiyêن civakî dijminên cîhana rizgarbuyî û ji ber vê yekê dijminên tevahiya me ne. Çaxa ku em bi rexne dayîn û rexneya kolektîf a xuyîbûnên şexsî û kolektîv ên me ya van uslub, zihniyet û prafîkên desthilatdar têdikoşin, pêwîst e ku dijminên derive, patron tev arteş û polîsên wan, bibin hedefa fişek, bombe û dînamît. Agirêñ dad û azadî paqij dikin û hertiş dixwin. Ji bo me tu paşveçûn û tu rê ber bi destkeftina rizgarî ve jî nîne li derveyî têkoşîn. Civakêñ me tenê wê rizgar bibin gava ku em wan ên ku kêm in, tenê dewlemend û bihêz in ji ber qehrîn û koletiya wan ên ku gelek in, biruxînin.

Axa azadî nade kole tenê ji ber exlaqêñ dilsojî, dîxwemî û êvîn. Dive ku kole rizgariya xwe bi reya serhildan, berxwedan û şoreş pêk bîne, bi karanîna her amûra axa ji bo ku hem axa hem jî mekanîzm û rîbazêñ wan a zilm û zordestî. Nîrê zordarî û zencîrêñ wê yên desthilat nikarin serhildana bindestiyan ragirin. Em li benda rojê ne ku şûr bibin sêlêñ gasin, lê heta vê rojê, heger ê çêbe, em çekêñ xwe bernadin. Hebûna IRPGF li ser bingeha pêwîstiya têkoşîna çekdarî pêk tê. Gava ku ev nema pêwîst e hebûna IRPGF wê biqedê. Nêrîna me dijberiya têgîna "arteşen rûniştî" yan komêñ şoreşger ên hestîkirî ku di hindirê xwe de bibin dewletêñ giravayî ye.

Nêrîna IRPGF ya navnetewî

Em bawer dikin ku şerê cîhanê seyêmin êdî destpêkiriye û şer di Sûriye, Ukrayîne û warêñ din ên cîhanê de tenê destpêk in. Pergala sermayedar, nêzîkê dawiya xwe, cîhan talan kirî û çavkaniyêñ wî dizî ye, dikeve krîza xwe ya girantirîn. Bê gelheyêñ karkerêñ zêde ji bo zindan û kargehêñ xwe dijberî û nakokiyêñ sîstema di bin krîz de derdi Kevin holê. Di heman demê ku hêzên emperyalîst li ser pariyêñ dawî ji bo sitirandina debara xwe şer dikin û faşîzm serê xwe hilfîne, têkoşîna hevpar li hemberî desthilatdariya sermaye û dewlet pêşdikeve. IRPGF wê xwediya hemû gelan derkeve ku dixwazin pêşeroja xwe bê TU şekilêñ zordestî, desthilat û koletî çêbe. Em çarreyêñ nasnameyêñ yekta û teybetmendiyêñ ku di şexs, civak û di navbera şexs û civakan hene nasdikin û li ser wan heşiyar in. Em pişa xwezaya pirşekîlî ya nasnameya mirovî û têkoşîn digrin û dixwazin û vê bi tevahî çêbe. Ji ber vê armancê em tevlî gel di her warê cîhanê de bi teybetbûna wan, û teybetbûna me, dibin, ji bo bigihîjin rizgariya me ya kolektîf.

KOLEKTÎF Û CIVAKÊN MÎLÎTAN, WEKHEV Û XWEBIRÊVEBIRÎ

JI BO ŞOREŞ Û ANARŞÎZM!



*International Revolutionary
People's Guerrilla Forces
IRPGF*